Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1066 | 21-Gulan- 2023 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ nameronahi@gmail.com ☎ 423165

# Xwendekar bi hişê sûnî sparteké xwe çêdikin: Kes nikare fehmbike

**Xwendekarek zanîngehê ku navê innovate_rye li Reddit bikar tîne ji bo gotarek ku wî li ser hişê sûnî çêkirî nivîsand, A (di pergala herfan de pileya herî bilind) wergirt.**

Daxuyand ku ew li dibistanê wekî xwendekarek stêrk tê dîtin, innovate_rye modelek zimanek hişmendiya çêkirî bikar tîne da ku piraniya karên xwe yên malê biqedîne.

GPT-3 bi hevalên xwe re bikar anî da ku peywira xwe ya kaxezê ya li ser siyaseta cîhanê temam bike.

Koma hevalan di sala dawî de diyar kir ku pûanên wan hatine şikandin ji ber ku di metna hişê sûnî de referansên gotarên din tune ne, lê ew ji hêla mekanîzmayên kontrolkirina nivîsbarîyê ve nehatine girtin.

AeUsako got : “Ji ber ku min serlêdana Open AI-ê kir, min



Xwendekarekî pola yekem ê beşa biyokîmyayê dixwîne wiha got: “Mînakî ji me tê xwestin ku em 5 tiştên baş û nebaş ên li ser biyoteknolojiyê binivîsin. Min ji hijê sûnî çêkirî pirsî, “5 tiştên baş û nebaş ên biyoteknolojiyê çi ne?” “Ez pirsek bi vî rengî dişînim û ew bersivek ku A tê standin dide min.”

Xwendekar ji VICE re axivî û diyar kir ku beriya ku hişê çêkirî bikar bîne, karê malê ku wî wekî “karê dirêj” dihesibîne bi kêmî ve du saet dikişand û niha ev dem daxistiye 20 deqîqeyan.

Xwendekar got: “Ez hez dikim gelek tiştan hîn bibim, û ji ber vê yekê ez carinan dereng dimînim an jî dev jê berdidim.”

Ku meriv bikaribe vê zûtir û bi bandortir bike ji min re wekî jêhatîbûnek xuya dike.

Ji hêla din ve, innovate_rye ne tenê ye. Ji dema ku fîrmaya hişê sûnî OpenAI modela zimanê pir tê bikar anîn GPT-3 derxist , gelek xwendekaran dest bi serlêdana bernameyên weha kirine.

Nivîsarên ku bi van modelên zimanî têne hilberandin bi gelemperî ji tiştên ku mirov dinivîsin nayên cûda kirin.

Xwendekarekî lîseyê ku navê AeUsako_ li Reddit bikar tîne hewce nedît ku hemî wextê xwe bi nivîsandinê derbas bikim.”

Pisporê hişê çêkirî û akademîsyenê Kanadayî George Veletsianos diyar kir ku ev bername ji hêla teknîkî ve tekstên orîjînal çêdikin û ji ber vê yekê ji algorîtmayên nivîsbarîyê ve nayên girtin.

Zanyar wiha got: “Nivîs ji cihekî din nayê kopîkirin, bi makîneyekê tê hilberandin. Ji ber vê yekê nermalava(întihala) kontrolkirina nivîsbarîyê nikare wê tespît bike.”

Ger em nefikirin ka em çawa dikarin di pêşerojê de amûrên kontrolkirina nivîsbarîyê baştir bikin, ez nafikirim ku ew ê nikaribin nivîsa ku ji hêla AI-ê ve hatî çêkirin tespît bikin.


Di vê navberê de, Open AI xwe amade dike ku modela zimanê xwe ya nû û pir pêşkeftî, GPT-4 derxîne.

Ji VICE re axivîn, xwendekar dibêjin ku ew bi dilgermî li benda GPT-4 ne û dê dev ji karanîna hişa sûnî bernedin da ku gotaran binivîsin.

**Werger: Çandname**
**Berhevkar: Cagla Uren**

# Pirtûka “Dengbêj Şakiro” ji bona soranî hate wergerandin

**Li parêzgeha Silêmaniyê ji bo nasandina pirtûka “Dengbêj Şakiro” bi amadebûna hunermend û kesayetan merasîmek hate lidarxistin. Rêjen Hesen kitêba “Dengbêj Şakiro” ji Kurmancî wergerandiye Soranî.**




Ji bo nasandina Soraniya pirtûka “Dengbêj Şakiro” li hola Xak a Silêmaniyê bi amadebûna hunermend û kesayetan merasîmek hate lidarxistin. Pirtûka ji aliyê Omer Guneş û Îbrahîm Şahîn ve bi zaravayê Kurmanciya jorî hatiye nivîsîn. Her wiha ji aliyê nivîskar Rêjen Hesen ve bi zaravayê Soranî hatiye wergerkirin ku li gel encamên lêkolîneke li ser dengbêjî û formên wê, di dîroka stran û muzîka Kurdî de cihê dengbêjiyê, li ser jiyana dengbêj Şakiro ye.

Rêjen Hesen derbarê xebata xwe de got, “Ev pirtûk wê ji bo wan kesên ku dixwazin derbarê dengbêjî û mûzîkê de lêkolînê bikin, bibe çavkaniyeke gelekî baş. Ji bo naskirina bûyerên dîrokî yên ku dengbêj Şakiro di stranên xwe de behsa wan kiriye jî rêyeke baş e. Armanca wergerandina pirtûkê ew e ku muzîkjen û hunermendên Başûr bi dengbêjên Bakur û Rojavayê Kurdistanê bidin nasîn.”

Piştî merasîmê, pirtûka “Dengbêj Şakiro” li beşdarvanên merasîmê hate belavkirin.

Dengbêj Şakiro sala 1931’ê li Agiriyê ji dayik bûye. Bi ciwanî dest bi dengbêjiyê kiriye. Ji bo bibe dengbêjek baş, li gelek herêmên Bakurê Kurdistanê geriyaye û bûyerên dîrokî yên Kurdî kirine kilam. Dengbêj Şakiro, sala 1996’an di 65 saliya xwe de koça dawî kiriye.

## Sudoku: Bersiv 75


| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 8 | 5 | 2 | 7 | 3 | 9 | 1 | 6 | 4 |
| 7 | 3 | 1 | 2 | 6 | 4 | 8 | 9 | 5 |
| 4 | 9 | 6 | 5 | 1 | 8 | 7 | 3 | 2 |
| 6 | 1 | 7 | 9 | 5 | 3 | 4 | 2 | 8 |
| 9 | 8 | 4 | 6 | 2 | 7 | 3 | 5 | 1 |
| 5 | 2 | 3 | 4 | 1 | 8 | 9 | 7 | 6 |
| 1 | 6 | 9 | 8 | 7 | 2 | 5 | 4 | 3 |
| 3 | 4 | 5 | 1 | 9 | 6 | 2 | 8 | 7 |
| 2 | 7 | 8 | 3 | 4 | 5 | 6 | 1 | 9 |

## Sudoku:Pirs 76

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 2 | | 5 | 1 | | | | | 6 |
| 7 | | | | 3 | | | | |
| 4 | 8 | 1 | | | | | | |
| | | 9 | | 7 | 3 | 2 | | |
| | 4 | 7 | | | | 8 | 3 | |
| | | 3 | 5 | 9 | | 6 | | |
| | | | | | | 7 | 5 | 3 |
| | | | | 6 | | | | 4 |
| 1 | | | | | 7 | 9 | | 8 |

## Quncika Têgînan

| Ast | Pile, rade, derece, sewiye, hîza, darax. Bilindî û nizimiya tiştekî: Filankes di mijara ziman de ne di asta filankes de ye. |
|---|---|
| **Belge** | Tişta ku tiştekî misoger dike. Delîl, govan, dokûment. Sûcê filankesê hat belgekirin. Belgeya ku min pere dayînê di destê min de ye. |
| **Dane** | Agahî. Daneyên di destê me de têra sûcdarkirina wî dikin. |
| **Demografî** (Fransî) | 1.Lêkolînên li ser komên mirovan yên ku li herêmekê dijîn. 2.Gelhe, nifûs, xelk, komên mirovan yên li herêmekê dijîn. Dagîrker demografiya Kurdistanê diguherînin. |
| **Klînîk** (Fransî) | Ciyê ku venêrîna nexweşan lê tê kirin. |
| **Maske** (Fransî) | Rûpoş, berû, girtek, rûyîn, mask, berdevik |
| **Nivîsgeh** | Dezgeh, daîre, bûro, ofîs. Ciyê ku karê nivîsê lê tê kirin. |
| **Sînevizyon** (Fransî) | Ekranên gelek mezin, televizyonên gelek mezin. |
| **Stratejî** (Fransî) | Ji bo demên dirêj plan û proje. |
| **Venêrîn** | Pişkinîn, teftêşkirin: Di ketina bajêr de endamên asayişê li me venêrîn. Bijîşk li nexweş venêrî. |




# “Bi fikrê Rêber Apo pira azadiya jinê ava dibe”

Dayikên Şehîdan yên Bajarê Dêrikê diyarkirin ku armanca dewleta Tirk ji tecrîda li ser Rêber Abdullah Ocelan tunekirina gelê kurd û şoreşa jinê ye ku bi saya fikrên Rêber Apo hat destpêkirin û gotin, azadiya fîzîkî ya Rêber Apo azadiya jinan e. **R-2**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1066 | 21-Gulan- 2023 | www.ronahi.net/ku/

# ŞEHÎDÊN GULANÊ MÎRASÊ TEKOŞÎNA AZADIYÊ NE

Gulan di nava gelê welatparêz ê Kurdistan û Tirkiyeyê de û di nava Tevgera Azadiya Kurdistanê de meha şehîdan tê naskirin. Di têkoşîna azadî û demokrasiyê ya PKK’ê ya 40 salan de gelek şehîd hatin dayîn. **R-5**



## YRD: Hevrê Karwan Horamî bû yek ji rêwiyên heqîqetê




YRD’ê rojnamevan Karawan Horamî bi bîr anî û got: “Hevrê Karwan Horamî li ser rêya şehîdan, li ser rêya Mazlûm Dogan, Gurbetellî Ersoz, Nûjiyan Erhan, Denîz Firat, Qasim Engîn, Sîrwan Nalî, Dozdar Hemo û hemû Şehîdên Çapemeniya Azad bû û bû yek ji rêwiyên heqîqetê.”**R-3**

## “Rola Jinên Ciwan Di Werzîşê De Bingehîn e”



**Jina ciwan di tevahiya qadên jiyanê de bû bingeha serkeftin û pêşketinê, yek ji qadên ku xwe tê de birêxistin kir û nasnameya xwe kir, qada werzîşê bû. Hevseroka Desteya Ciwan û Werzîşê Henan Bekar diyar kir ku jina ciwan bi awayekî çalak tevî qada werzîşê bû û roj bi roj pêş dikeve.** R-6

## “Xwendin Hebûn e”



Bi dirûşma “Xwendin hebûn e” Duyemîn Pêşangeha Pirtûkên kurdî li Qamişlo hat lidarxistin, di pêşengehê de 12 hezar û 140 pirtûkên bi mijarên jin, şoreşgerî, ziman, çand, ol, fikr, dîrok, felsefe, şoreşa azadiyê û Şoreşa Rojava hatin pêşandan.**R-7**



## PDK’ê li ser hebûna gelê kurd xeter e

R-4

**Têkbirina nebaşî û zilmê di destên mede ye**
Hafiz Ahmed R-6

**Di hilbijartinan de ‘dergûşkîketin’**
Ahmed Aktaş R-4

**Bila Derba 28 Gulanê Mekintir Be**
Idrîs Henan R-5

# "Rola Jinên Ciwan Di Werzîşê De Bingehîn e"

Jina ciwan di tevahiya qadên jiyanê de bû bingeha serkeftin û pêşketinê, yek ji qadên ku xwe tê de birêxistin kir û nasnameya xwe kir, qada werzîşê bû. Hevseroka Desteya Ciwan û Werzîşê Henan Bekar diyar kir ku jina ciwan bi awayekî çalak tevî qada werzîşê bû û roj bi roj pêş dikeve.

**Zana Roj/ Qamişlo**

Şoreşa Rojava şoreşeke jinê ye. Jinê ji şoreşê re pêşengtî kir û di her qadê Rêveberiya Xweser de xwe rêxistin kir û îro ji bo hemû cîhanê bûye hêvî. Jinan di 19'ê Tîrmeha 2012'an de çirûska destpêkeke nû vêxist. Piştî wê roj bi roj gelek gavên serkeftî avêtin û qadên xwe yên xebatê berfereh kir. Bi taybetî rola jina ciwan di her qadê de ber



bi çav bû, jina ciwan di perwerde, akademî, siyaset, parastina civakî, maf û edalet, aboriya komînal, têkilî, çand û huner, tenduristî, ragihandinê de cihê xwe girt û bi roleke sereke rabû. Yek ji van serkeftinên jina ciwan ya ku bi şoreşê re bi dest xist jî, di milê werzîşê de bû. Wekî her qadê, jina ciwan di nava werzîşê de cihê xwe girt û ji bo pêşxistinê bû bingeh. Di tevahiya çalakiyên werzîşê de beşçdar bû û muhra xwe lê xist. Têmên werzîşê yên jinan hatin avakirin û di tevahiya lîstikên werzîşê yên li ser asta bakur û Rojhilatê Sûriyê beşdar bûn. Derbarê rola jinên ciwan yên bakur û rojhilatê Sûriyê di werzîşê de Hevseroka Desteya Ciwanan û Werzîşê ya bakur û rojhilatê Sûriyê Henan Bekar ji rojnameya me re axivî.

Henan diyar kir ku rewşa jinên ciwan di tevahiya milan de, bi awayekî ber bi çav, roj bi roj pêş dikeve û wiha domand: "Hebûna jina ciwan û rola wê ya di tevahuiya aliyên civakî û jiyanî de pir girîng e, ji ber ku jina ciwan bingeha civakê ye û rola wê di azadiya civakê de sereke ye."

**'Jina ciwan di werzîşê de jî xwe isbat kir'**

Henan da xuyakirin ku ji destpêka damezrandina Desteya Ciwanan û Werzîşê ve, desteyê ji bo bilindkirina asta werzîşê kar kir û wiha got: "Ji bo ku jin cihê xwe di xebatên werzîşê de bigre, pir ked hat dayîn. Desteya Ciwanan û Werzîşê dewreyên perwerdyên werzîşê û gelek navendên werzîşê yên taybet ji bo jinan vekirin, herwiha her dem jinan li ser asta bakur û rojhilatê Sûriyê cihê xwe di xebatên werzîşê de girtin. Bi taybetî beşdarî



xebatên Fûtbol, goka masê, şetrenc û lîskên hêza bedenî bûn.Herwiha cihê di tevahiya lîstkên komî û kesî de jî girtin. Bi taybetî werzîşa jinê di herêma Cizîrê de bi pêş ket û jinan li hemberî tevahiya astengiyan rola xwe di werzîşê de lîstin. Li herêma Feratê jî jin di warê werzîşê de bi pêş ket û gelek tîmên jinan hatin avakirin. Li ser asta bakur û rojhilatê Sûriyê di tevahiya lîstkên werzîşê de tîmên jinan hene û jin çalakin."

**'Êrîşên dagirkeriyê û şerê taybet dibin asteng'**

Henan balkişand ser astengiyên ku derdikevin pêş Desteya Ciwanan û Werzîşê de û wiha got: "Ji destpêka damezrandina desteya ciwan û werzîşê ve, binesaziya werzîşê li seranserî herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê hat avakirin, gelek stad û navendên werzîşê hatin sazkirin, lê astengiya sereke li hemberî pêşxistina werzîşê û bi taybetî ya jinan, êrîşên dewleta Tirk a dagirker û şerê taybet bû. Dewleta Tirk a dagirker herdem bi riya şerê taybet dixwest ciwanan bê hêz bike û wan ji civak û çanda wan qut bike."

**'Çalakiyên cur bi cur hatin lidarxistin'**

Henan derbarê xebat û çalakiyên werzîşê wiha got: "Li ser asta bakur û rojhilatê Sûriyê, desteyê bi gelek çalakiyên ji bo ciwanan rabû, herwiha li ser xeteriya madeyên hişbir, zewaca temen biçûk û koçberiya ciwanan gelek semîner û perwerde hatin dayîn. Desteyê ji bo jina ciwan çalakiyên taybet li dar xistin, wekî çalakiya 8'ê Adarê, pêşengeha wênesaziyê û roja helbestê. Herwiha li ser asta herêman gelek çalakiyên werzîşê yên cur bi cur ji bo jinan hatin lidar xistin û jinan cihê xwe di tevahiya xebatên werzîşê de girtin."

**'Emê nasnamya jina werzîşvan ronî bikin'**

Henan da zanîn ku xebata herî girîng ya ku Desteya Ciwanan û Werzîşê pêk anî, çalakirina Yekîtiya Werzîşê bû û axaftina xwe wiha Qedand: "Di sala 2023'an de Konferansa Damezrandina Yekîtiya Werzîşê hat lidarxistin, tê de beçdarbûna jinê fireh bû. Armanc ji avakirina Yekîtiya Werzîşê ew ê ku asta werzîşê bilintir bibe, lîstikên ku hatine paşguhkirin werin çalakirin û avahiyên werzîşê, stad û navendên wê werin rêxistikirin. Me plankiriye ku di demên pêş de xebatên werzîşê yên jinên ciwan zêdetir bikin û çalakiyên ku balê dikşînin ser jêhatiyên ciwanan berfirehtir bikin. Herwiha nasnameya jina ciwan di milê werzîşê ronî bikin."

## Têkbirina nebaşî û zilmê di destên mede ye



**Hafiz Ahmed**

Hilbijartinên li Tirkiyê bûne leyistikên Osmaniyan. Qaşo bi nirxên dewletên Awrupî û rojava girêdayîne. Xwe di cîhana Îslamî de dewletek demokrat dihesibînin û bi demokratbûna xwe pesnên xwe didin. Wêcarê bi eşkerebûneke zelal derket holê ew jî xapandin û dereweke mezin e. Dibêjin Mistafa Kemal Atatûrk mafê dengdanê li Tirkiyê misoger kiriye. Ev mafa wek xapandina cîhanê bikar anîne û neha eşkere bikar tînin. Hilbijartinên xwe jî, weke perdeyek dijî mafên mirovan, netewan, ol û mezheban bikar anîne/tînin. Bi taybet neha gelê me fêr buye ku nûnerê xwe hilbijêre, li beramber wê benda hilbijartinê danîn. Rexmî wêna jî gelê me bi tekoşîna xwe ew bendav jî têk bir. Îcar jî ji bo hilbijartinên hilbijêran negihêjin armancên xwe, dek û dolabên cuda digerînin. Dengan didizin, hêviyên Mirovan dişkînin. Ev karê han karê Erdogan tenê nîne, karê dewleta dagirker û qirker e. Eva wek planekî giştî amade kirine daku hêviyên Mirovên dij xwe têk bibin. Divê kesên dij vê Pergalê kar dikin û jê acizin, hemû cure tekoşînan pêşbixin. Neha qerektera pergala Kemalîst ya rasteqîne eşkeretir derdikeve holê.
Di Şexsiyeta Erdogan de derket holê kû ev Komar komareke gemar, kujer, bê ehlaq, diz û zalim e. Di pêşengiya Erdogan de, hîzbul qontra, Mhp, Mafya, kujer hemû rengên xerabî û nebaşiyê eşkere bûn û hatin berbiçavkirin. Bi tekoşîna gelê Kurd perdeyên ser rûyên nebaş, Minafiq û Kafiran yek bi yek dikevin. Dînadriya wan, demokratbûna wan, sosyalîst bûna wan hemû derkete ber çavan. Bê guman ev tekoşîn ewê wan têk bibe.
Bi Qeyyuman bi zindanan, bi lêdanê nikarin hêviya gel bişkînin, dixwazin bi şerê taybet hêviyan têk bibin.
Divê di rêberiya Gelê me de hêviyên azadî û aramiyê pêş bikievin. Ev erk di Pêşengiya Tevgera Netewa Kurd de pêş dikeve. Di Rojava de ev gihaştiye astekî bilind. Ger em karibin bi sîstema Tirkên qirker wan bişkînin, emê pêşî bi yek carî li Kurdan vebikin. Kurdan di tekoşîna xwe ya li Bakurê Kurdîstanê û Tirkiyê de pêşkeftinên berbiçav bidest anîne.
Erdogan ji bo Tekoşîna Kurdan têk bibe wek Komara Tirk hemû leystikên qirêj û gemar berdewam dike.
Divê em hişyar û zana tevbigerin.
Em wek kesên êş dîtî û mexdûr di hilbijartina tûra duyem de, vê pergalê belav bikin.
Ji bo wê divê em xebatên hilbijartinê bi coşeke mezin bimeşînin.
Em bixwe kolan bi kolan, gund bi gund, kes bi kes bigerin û ziyaret bikin dakû wê Fîrewnê hemdem bişkînin.
Xwedayê mezin weha ferman dike:'Di riya Xwedê de kar bikin (riya Xwedê edalet pêk anîne), an na hûnê bi destê xwe, xwe tune bikin, başiyê bikin Xwedê kesê başiyê dike hez dike'. (baqere 195)
Ji bona civaka Turkiyê û Kurdan tekbirina Erdogane gelek giring e. Ji ber ku têkçûna Erdogan pêşîlêgirtina xerabiyan e.
Bawermendên rast û dirust divê herî zêde ji bona dengdanê kar bike.
Lewre carekî din hilbijartina vê Fîrewnî, têk birina bi yek carî ya Ola Îslamî ye. Bi serkeftina Erdogan dê li dinyayê kuştin û fesadî, fitne û bê exlaqî wê bighêje lûtkê. Kurdno!
Mifta tilsima têkbirina vê Zalimî di desê me de ye, ger em deng bidin û derdorên xwe bibin dengdanê ewê Erdogan bi cehime û her e.

# Dorpêçê xebatên şaredariyan anîne ber sekinînê

**Dorpêça hikumeta Şamê li taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê xebatên şaredariyê asteng dike.**

Siyasetên li dijî gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê dewam dikin û dorpêça li ser herêmê ji gelek aliyan de tê ferzkirin. Lê saziyên Rêveberiya Xweser hewl didin xizmetguzariyî pêşkêş dikin.

Şaredariyên gel projeyên xwe yên xizmetguzariyê dewam dikin û jiyana welatiyan hêsan dikin.

**Li Reqayê, şaredariya gel 3 projeyên kanalîzasyonê temam kirin.**

Li ser vê yekê, çavdêrê li ser projeyên kanalîzasyonê li Reqayê Xelîl El Ebo got Şaredariya Gel a Reqayê projeyên xwe yên kanalîzasyonê li taxên bajêr dewam dike û wiha got: "Me ev proje ji bo amadekirina kolanan beriya qîrkirinê da destpêkirin, da ku pirsgirêk di torên kanalîzasyonê de dernekevin."

Ji bo temamkirina projeyên 2022-2023`yan Şaredariya Gel a bajarokê Xas ê Dirbêsiyê ya Hesekê parçeyek ji rêya giştî ya Hesekê-Dirbêsiyê ya li gundê Seidiyê Şêxan qîr kir. Dirêjahiya rê 4 hezar û 240 metre ye.

Di heman demê de qîrkirina rêya di navbera gundên Sorika Jorîn û Jêrîn a bi dirêjahiya 3 hezar û 500 metre, temam bû.

**DORPÊÇ XEBATÊ ASTENG DIKE**

Şaredariya Gel a taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê yên Helebê, ruxmî dorpêça hikumeta Şamê û qedexeya derbaskirina madeyên bingehîn û sotemeniyê, xebata xwe dewam dike.

Bi hatina havînê re, werşeyên



şaredariyê gelek xebat li Parka Efrîn a li taxa Eşrefiyê ku di 2019`an de hatiye vekirin, pêk anîn. Li parkê kursî hatin danîn, dar hatin çandin û naforeke avê hate danîn.

Li ser hûrgiliyên vê yekê endazyarê Şaredariya Gel a Şêxmeqsûd û Eşrefiyê Ednan Jaro wiha got: "Em bi hemû hêza xwe û derfetên xwe yên kêm hewl didin xizmetê ji bikin. Ruxmî ku dorpêç bi awayekî mezin li pêş van projeyan dibe asteng."

Par, şaredariyê li Qada Cebanat a li rojhilatê taxa Şêxmeqsûdê kursî danîn, dar çandin û naforeke biçûk çêkir. Her wiha hin karên din li Parka Arîn Mîrkan a li rojhilatê taxê kirin. Jaro wiha domand: "Par me hin xebatên sererastkirinê li qada Cebanat kirin. Me kavilên şer rakirin û Parka Arîn Mîrkan sererast kir."

Jaro destnîşan kir ku ew dixwazin ji vê zêdetir xizmeta welatiyan bikin, cihên geştiyariyê û parkan çêkin, lê pirsgirêk dorpêç e.

Li gorî rêveberên şaredariyê, ger derfet peyda bin, dê projeya ronîkirina rêyên taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê dest pê bike. **ANHA**



# YRD: Hevrê Karwan Horamî bû yek ji rêwiyên heqîqetê

YRD'ê rojnamevan Karawan Horamî bi bîr anî û got: "Hevrê Karwan Horamî li ser rêya şehîdan, li ser rêya Mazlûm Dogan, Gurbetellî Ersoz, Nûjiyan Erhan, Denîz Firat, Qasim Engîn, Sîrwan Nalî, Dozdar Hemo û hemû Şehîdên Çapemeniya Azad bû û bû yek ji rêwiyên heqîqetê."

**Navenda nûçeyan**

Yekitiya Ragihandina Demokratîk (YRD) ji ber şehadeta rojnamevan Karwan Horamî daxuyaniyeke nivîskî weşand.

"Rojhilatê Kurdistanê jî di destpêkê de bi rêya Çapemeniya Azad (Med Tv, Roj Tv, ajans û hwd.) raman û felsefeya Rêber Apo nas kir, tevlî nava refên Têkoşîna Azadiya Kurdistanê bûn. Komploya Navneteweyî ya 15'ê Sibatê û dîlgirtina Rêber Apo weke êrişa li dijî navenda raman û vê têkoşînê pênase kirin. Ev yek jî bû sedem ku gelek ciwanên Rojhilatê Kurdistanê yên li zanîngehan dixwendin Tevgera Azadiya Kurd PKK'ê nas bikin û tevlî nava refên têkoşînê bibin.

Hevrê Mihemed Melêkî bi nasnav Karwan Horamî jî yek ji wan ciwanan



bû ku sala 2008'an tevlî nava refên gerîla bû. Hevrê Karwan li gundê Text ê ser bi Jwanro ya Hewreman li ser çand û keveneşopiya neteweyî mezin bû, ciwanek rewşenbîr, xwedî têgihiştineke kûr a serwext bû. Ev taybetmendî kir ku ji aliyê hevrêyan û kesên nas dike ve were hezkirin û cihê baweriyê be.

Têgihiştina raman û naskirina rêxistinê ya hevrê Karwan a li gel karê rojnamevaniyê wisa kir ku girîngî zêdetir bide vê xebatê û ji destpêka tevlîbûnê ve di qadên cuda yên Çapemeniya Azad de dest bi kar û têkoşînê bike, erk bigire ser milê xwe. Bi hestê berpirsyarî û hevrêtî tevlî nava kar bû, ti demê sedemên tenduristî yên xwe nexist pêşiya erkên xwe. Bi ruhê şoreşgerî yê Apoyî zêdetirî 15 salan temenê xwe ji bo gelê xwe feda kir, beşek mezin a temenê xwe di karê ragihandinê de derbas kir.

Hevrê Karwan Horamî li ser rêya şehîdan, li ser rêya Mazlûm Dogan, Gurbetellî Ersoz, Nûjiyan Erhan, Denîz Firat, Qasim Engîn, Sîrwan Nalî, Dozdar Hemo û hemû Şehîdên Çapemeniya Azad bû û bû yek ji rêwiyên heqîqetê.

Şehadeta hevrêyê me Karwan di demeke welê de ku dijmin bi şerê taybet li dijî gelê me çend qad zêdetir kiriye û dixwaze gelê Kurdistanê tine bike, ji bo Çapemeniya Azad, demokratîk û gelê welatparêz ê Kurdistanê xisareke mezin e.

Em Yekîtiya Ragihandina Demokratîk (YRD) sersaxiyê ji bo malbata şehîd Karwan, gelê welatparêz, Rêber Apo û hemû têkoşerên Çapemeniya Azad re dixwazin. Ji bo parastina ew nirxên ku şehîdan ragihandî ku ji bo bigihêjin armancan, soza xwe di serî de ji bo hevrê Karwan û hemû şehîdên rêya azadiyê dubare dikin.

Her wiha ji bo serxistina Şoreşa 'Jin, Jiyan, Azadî' ya ku îro li ser bingehê raman û felsefeya Rêber Apo bûye şoreşeke cîhanî, ala têkoşînê em ê bilind bikin, Çapemeniya Azad bikin deng û rengê azadîxwazan."

# "Beyannameya Rêveberiya Xweser ji aliyê teorîk û fikrî ve gelekî girîng e"

**Navenda nûçeyan**

**Fîras Qesas diyar kir ku beyannameya çareseriyê ya Rêveberiya Xweser ji aliyê teorîk û fikrî ve pir girîng e. Qesas anî ziman ku hin hêz diyaloga sûriyeyî-sûriyeyî asteng dikin û got "Gelo zordest, tundraw û ajan dikarin ji nişka ve bibin azadîxwaz û alîgirên diyalogê?"**

Rêveberiya Xweser di 18`ê Nîsanê de ji bo çareserkirina aloziya Sûriyeyê beyannameyek ragihand.

Beyanname ji aliyê gelek hêz, partî û kesayetên sûriyeyî û erebî ve erênî hat nirxandin, lê hin amûr û dûvikên dewleta Tirk a dagirker êrişî Rêveberiya Xweser kir û hewl da tawanbarî û îdiayan der barê beyannameya wê de belav bikin.

**'Hin hêz diyaloga sûriyeyiyan asteng dikin'**

Muxalifê sûriyeyî û serokê Partiya Nûjen û Demokratî bo Sûriyeyê Fîras



Qesas têkilarî mijarê axivî.

Fîras Qesas got: "Bê guman diyaloga sûriyeyiyan girîngtirîn rengên diyaloga der barê Sûriyeyê de ye. Çima? Ji ber ku dema pêk were dê dînamîk û xulaseyên wê sûriyeyî û aktîf bin. Ev diyalog yekser girêdayî Sûriyeyê ye û hemû tiştên pê ve girêdayî jî girêdayî Sûriyeyê ne, ji ber ku encameke bi îradeya sûriyeyiyan e. Dê ji bo derbaskirina aloziyê jî bingehekê deyne."

Qesas anî ziman ku hin hêzên aktîf û sereke di mijara Sûriyeyê de vê diyalgoê asteng dikin û wiha dom kir: "Ji ber ku bingehê wan hemû derfetên girêdayî diyalogê red dikin, mînaka wê jî rejîm e ku tenê bi mentiqê serwerî, zordestî, dûrxistinê nêzîkî mijarê dibe. Hem jî hêzên tundraw û ajanên dewleta Tirk ku girêdaya wan bi derve re di ser siberoja Sûriyeyê re ye."

Qesas têkildarî beyannameya Rêveberiya Xweser jî wiha axivî: "Bê guman di wateya teorîk û fikrî de girîng e, ne tenê ji ber ku çareseriyê bi pêş dixe, lê belê ji ber ku bi giştî propagandayên hêzên dijberî tecrûbeya komînal a demokratîk a li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, vala derdixe. Her kesê besha bandorên wê yên cudaxwazî, dûrxistin an jî ajandeyên derve dikin, dê bi vê beyannameyê bersivek tund jê re bê dayîn."

Qesas wiha nirxandina xwe domand: "Bê guman, beyannameya Rêveberiya Xweser bi 9 xalên xwe, pir girîng e, bandora berifreh a tecrubeyên Rêveberiya Xweser li hember rejîmê û hêzên ajan û tundraw nîşan dide. Lê di pratîkê de, bêyî beşdarbûna aliyên din ên sûriyeyî nikare pêk were. Heke berjewendiyên wan hêzan tune bin, dê beşdar nebin."

**'Niha însiyatîf a aliyên din e'**

Têkildarî gavên ku divê piştî beyannameyê bên avêtin, Qesas diyar kir: "Mixabin heta ku aliyên sûriyeyî yên ku tê xwestin beşdar bibin, beyannameyê red dikin, dê tu gavên atkîv tune ji bo pratîzekirina vê beyannameyê neyên avêtin. Ev beyanname dê wekî belgeyeke nîştimanî û nirxekî bimîne ku em ê li hember her kesê ku gumanan ji tecrubeya Rêveberiya Xweser dike, bilind bikin."

Qesas destnîşan kir ku Rêveberiya Xweser berpirsiyariyên xwe yên li hember siberoja Sûriyeyê û azadiya gel û pêkhateyên wê, pêk anîn û wiha pê de çû: "Wê di têkoşîna li dijî terora DAIŞ~ê de gelek tişt dane, nirxên jiayna hevbeş li Sûriyeyê ava kir û hewl da ku vê tecrûbeyê li seranserê welat pêk bîne, her tim girîngî da diyalogê û banga wê kir. Bi vê yekê bi hemû hêz û derfetên xwe yên siyasî hewl da ji bo proseyê gav biavêje. Lê ji bo aliyên din, titşa jê tê xwestin ku bersivê bidin, yanî beşdarî diyalogeke giştî ya li ser esasê beyannameytê bibin.

Fîras Qesas wiha axaftina xwe bi dawî kir: "Gelo rejîm dikare dev ji zordariya xwe û feraseta welat wekî mulkiyeta taybet a wan be, berde? Gelo terorîstên El Nusrayê û hêzên îslamî yên tundraw dikarin bibin kevokên aştiyê, azadîxwaz û alîgirên diyalogê? Gelo ajanên rejîma Tirkiyeyê dikarin wiha ji nişka ve dev ji ajantiya xwe berdin û beşdarî diyaloga nîştimanî ya ji bo pirrengî û nenavendîtiyê, li ser nirxên jiyana hevbeş û qebûlkirina kesên din, bibin? Bawer im ev ne pêkan e. Mixabin."

# Di 17 mehan de 93 girtiyan jiyana xwe ji dest da

**Navenda nûçeyan**

**Di 17 mehên dawî de li girtîgehan 93 girtiyan jiyana xwe ji dest da. Parêzerê ÎHD'yî Ahmet Çîçek diyar kir ku desthilatdarî hiqûqa dijminatiyê pêk tîne û divê dest ji vê cotstandardiyê bê berdan.**

Di dema desthilata AKP'ê de li girtîgehan mafên bingehîn ên girtiyan hemû hatin binpêkirin. Nemaze jî astengkirina mafê dermankirinê yê girtiyên nexweş û neberdana wan, bû sedema binpêkirina mafê jiyanê. Li gorî daneyên Komeleya Mafên Mirovan (ÎHD), di sala 2022'yan de 78, di 5 mehên ewil ên sala 2023'yan de jî 15 girtî jiyana xwe ji dest dan. Girtiyên nexweş ku mafê wan ê tenduristiyê hat binpêkirin, ji ber raporên "dikare di girtîgehê de bimîne" yên Saziya Tiba Edlî (ATK), bi mirinê re rû bi rû hatin hiştin. Gelek girtî jî bi awayekî gumanbar jiyana xwe ji dest dan.

Li gor daneyên ÎHD'ê, hê jî 651 jê giran hezar û 517 girtiyên nexweş di girtîgehan de ne. Girtiyê nexweş Abdulhalîm Kirtay ku di lîsteya girtiyên nexweş a ÎHD'ê de bû, di 22'yê adarê de piştî 30 salan hat berdan. Kirtay, di 12'ê gulanê de jiyana xwe ji dest da. Herî dawî jî girtiyê nexweş Behçet Kaplan (31) ku di sala 2014'an de bi îdiaya "endamtiya rêxistinê" hatibû girtin, di 15'ê gulanê de li Girtîgeha Xelatê ya Bedlîsê ya Tîpa T'yê jiyana xwe ji dest da.

Berdevkê Komîsyona Girtîgehan a ÎHD'ê ya Şaxa Îzmîrê Ahmet Çîçek, anî ziman ku bi taybetî



mafê dermankirinê yê girtiyên siyasî tê astengkirin. Çîçek bilêv kir ku girtî pirî caran bi ambulansê sewqî nexweşxaneyê nayên kirin û got: "Lewma, pirî caran girtî naxwazin biçin nexweşxaneyê. Ji ber ku randevûyên girtiyên nexweş bi derengî tên xistin, nexweşînên wan giran dibin. Ji ber vê girtî bi mirinê re rû bi rû tên hiştin. ATK, suxreya desthilatê dike. Herî dawî girtiyê nexweş Beçet Kaplan ji ber nexweşîna pençeşêrê jiyana xwe ji dest da. Ji ber ku dermankirina wî hat astengkirin jiyana xwe ji dest da. Abdulhalîm kirtay bi salan di girtîgehê de ma û girtiyekî nexweş bû. Gava hat ber mirinê hat berdan. Piştî hat berdan 51 roj şûnve jiyana xwe ji dest da. Gava girtî tên ber mirinê, tên berdan. Yanî girtîgeh veguherîne mirinxaneyan."

Hiqûqa dijminatiyê

Çîçek bibîr xist ku endamên Hîzbullah bi biryara Serokkomarê AKP'î hatine berdan û divê dest ji vê cotstandardiyê bê berdan. Çîçek wiha dawî li axaftina xwe anî: "Madem karbidestiyeke wiha heye, nexwe divê ji bo her kesî wekhev bê pêkanîn. Mehmet Emîn Ozkan hem extiyar bûye hem jî nexweş e. Lê nayê berdan. Ev desthilat, hiqûqa dijminatiyê pêk tîne."

# PDK'ê li ser hebûna gelê kurd xeter e

Xiyaneta PDKê li ser her çar perçeyên Kurdistanê xetere, ew ji berjewendiyên xwe hewl dide ku Kurdan bi carekê re tine bike. Herî dawiyê ji bo têkbirina vîna gelê kurd li Rojava, PDK'ê Deriyê Sêmalka jî girt.

**Navenda Nûçeyan / Qamişlo**

çîna xayîn di Kurdistanê de bûye wekî amûrek şerê teybet û ji milê hêzên deshilatdar ve têne bikaranîn. Ev çîn nahêlin ku Kurd û şoreşa azadiya Kurdistanê biserkeve. Ji bo qirkirina Kurdan çi ji destê wan tê bê minet ji dijminê Kurdan re dikin. Çawa ku di serdema Enwer paşa de, serokê eşîrên Kurdan hevkarî û xizmet ji bo Osmaniyan dikirin, ciwanên Kurd bi kêf û eşq dişandin şeran ji bo dilê Osmaniyan xweş bikin. Ew kesên ku ew ciwanên Kurd dixstin serbaz ji bo Osmaniyan, niha jî heman tişt PDK'ê dike. Pêşmergeyên xwe hemû xistine xizmeta Erdoxan û bi wan şerê gêrilayên azadiya Kurdistanê dike. Osmaniya nû vê carê Kurdan bi destê Kurdan dide kuştin û bi vî rengî dixwaze Kurdan qir bikin.

**Ma gelo xiyanet bi çi rengî ye**

PDK'ê Ji bo deshilatdariya xwe û berjewendiyên xwe yên malbatî û eşîrî hewl dide ku Kurdên mayî jî bi carekê re tine bike, li ser kolekirin û sertewandina Kurdan, xwe bidin jiyankirin. Azadiya xwe di qirkirina Kurdan û tesfiyekirina tevgera azadiyê, Parstina deshilatdariya xwe jî di firotina Kurdan de dibînin. Lewra em dibînin ku PDK'ê ji dil û can xizmetê ji Erdoxan re dike. Dewleta tirkî ya dagîrker, ji sal a1983'an û vir ve li Başûrê Kurdistanê êrişên dagîrkeriyê pêk anî, di heman demê de bi rêya kampên îstîxbaratî û leşkerî yên bi desteka PDK'ê ava kiriye, hewl dide li vî parçeyê Kurdistanê jî serdest be. Piştî êrişên wê yên sala 1991'an li dijî Herêmên Parastinê yên Medyayê, kampên îstîxbaratî yên li xeta Hewlêr, Duhok û Zaxoyê veguheran baregehên leşkreî û bi hezaran leşker û maşînên leşkerî lê bi cih kir.

**PDKê bi nûkirina xiyaneta xwe re hewl dide ku temenê xwe dirêj bike**

Beriya destpêkirina şerê navxweyî



yê Sûriyeyê, di hedefa PDK'ê de vê carê Kurdên li Rojava hebû. Piştî destpêkirina şer, di 2'ê Çileya 2012'an de PDK'ê partiyên Kurd ên li Rojava vexwend, lê bang li PYD'ê nekir. Piştî ku Şoreşa 19'ê Tîrmehê bi pêşengiya PYD'ê hate kirin, PDK'ê dest bi dorpêçiya fîzîkî û leşkerî kir. Di nava komên çeteyên ku qaşo navê artêşa azad li xwe kirîbûn, yên ku êrîşa destpêkê li hemberî Rojava kirin, çeteyên bi navên Selahedîn Eeyûbî, Mistefa Barzanî û Azadî yên ser bi partiyên PDK'ê yên li Sûriyeyê hebûn.

Di 2'ê Çileya 2013'an de dema çeteyên ser bi El Qaîdeyê êrîşî Rojava kirin, PDK'ê deriyê sînor ê Sêmalka li Kurdên li Rojava girt. Endamê Dîwana Serokatiyê ya PDK'ê Elî Ewnî roja 10'ê Tebaxa 2013'an daxuyaniyek da û got 'Bila PYD ji xwe re deriyekî din veke. PDK'ê li gel dewleta tirkî di heman demê de li ser sînorê Rojava xendeq kolan. Serkirdeyê PDK'ê Mesûd Barzanî got "Ya ku li Rojava dibe şoreş nîne. PYD zilmê li gel dike. Li Rojava Esad bi xwe heye. Piştre destûr ji Hevserokê PYD'ê Salih Muslim re nehat dayîn ku di ser Hewlêrê re biçe Ewropayê. Bi gotineke quretî PDK'ê got"Salih Muslim dikare di ser Şamê re biçe derveyî welat. PDK'ê di 11'ê Sibata 2014'an de li ser navê Rêvberiya Kurdistanê ya Federal daxuyaniyek da û ragihand, ku ew Rêveberiya Xweser ya lÎ Rojava nas nakin. Ji despêka şoreşa Rojava ve, PDKê bi riya ENKS'ê li Ewropa û deverên cuda yên cîhanê, çalakî û dîplomasiya li dijî Rojava bi rê ve dibe û dixwaze Rêveberiya Xweser reş bike.

**PDKê bi riya destekdayîna dijimin hewl dide ku heta oksejînê jî li ser Kurdan qut bike**

Êrîşên dagîrkeriya Tirk yên ser herêmên Parastina Medyayê ji 23ê Nîsana 2021ê bi dijwarî didomin. Dagîêrkeriya Tirk di van êrişan de çekên kîmyawî bikar tîne û ev yek bi destekdayîna PDKê tê kirin. PDKê ne tenê kordînatên îstîxbaratî li ser nuqteyên gerîlayan dida dagîrkeriya Tirk, di heman demê de êrişî gerîlayan dikir. Çekdarên PDKê di 28ê Tebaxa 2021an de, li herêma Xilêfanê kemînek ji gerîlayan re danîbû û di encamê de 5 gerîla şehîd bûn, ji wan şehîd Tolhildan Raman û Serdem Cûdî yên ji Rojava ne.

**'Girtina deriyê Sêmalka zincîreke din ji zincîra xiyanetê ya PDK'ê ye'**

Ji destpêka Şoreşa Rojava û heta niha PDK'ê ji bo têkbirina Rêveberiya Xweser gelek hewildan kirin, yek ji hewldanên wê jî girtina deriyê Sînorî yê Sêmalka ye, ku bi dehê caran bi hincetên cûda ji aliyê PDK'ê ve hatiye girtin. Armanca sereke jê, razîkirina dewleta Tirk a faşîst e, herwiha têkbirina projeya netewya demokratîk ku kurdên Rojava pêşengî jê re kirin e.

# Îranê sê kes bi dar ve kirin

**Rejîma Îranê bi îdiaya ku 'tevlî şerê li dijî Xwedê bûne' 3 kes dar ve kirin. Dezgeha dadweriya Îranê ragihand ku 3 kesên ku bi tohmeta kuştina 3 endamên hêzên rejîmê di dema serhildana Jîna Amînî de hatine cezakirin û sibeha 19'ê Gulanê hatine bidarvekirin.**

Hate diyarkirin ku Mecîd Kazimî, Salih Mîrhaşimî û Seîd Yaqûbî di xwepêşandana li Îsfehanê de bi hinceta ku çek bi wan re bûn û 'tevlî şerê li dijî Xwedê (mûharebeh)' bûne, cezayê bidarvekirinê li wan hatiye birîn.

Sê kesên di Mijdara bihurî de hatibûn girtin, di Çileyê bihûrî de hatibûn mehkûmkirin. Dezgeha dadweriya Îranê, van her sê kesan sûcdar dike bi kuştina sê endamên hêzên rejîmê.

Li gorî rapora Rêxistina Efûya Navneteweyî ya sala 2022'yan a derbarê bidarvekirinê de, Îran piştî Çînê di rêza duyemîn de ye. Bidarvekirinên li Îranê di sala 2021'û de 314 bû û ev hejmar di sala 2022'yan de bûye 576. Tê diyarkirin bîlançoya rastîn ji vê hejmarê girantir e.

**"Em komarek hatiye darvekirin naxwazin"**

Li gelek deverên Îranê, gel li dijî darvekirina sê girtiyên siyasî bertekên tund nîşanî dan. Piştî ku sê girtiyên siyasî yên bi navê Salih Mîrhaşimî, Mecîd Kazimî û Seîd Yakubî hatin darvekirin, xwepêşanderên Zahîdanê piştî nimêja înê daketin qadan û dirûşm berz kirin. Piştî nûçeya bidarvekirina sê xwepêşanderên ku li Îsfehanê hatin girtin welat ket rewşeke aloz û nebaş.

Gelê Belûcê bi tûndî darvekirina 3 girtiyên siyasî yê di doza Mala





Esfehanê de şermezar kirin û careke din nerazîbûna xwe ya li dijî hikûmeta Îranê bi qîrîna dirûşmên "Em komarek hatiye darvekirin naxwazin" berz kirin.

Xwepêşanderên dirûşmên "Birayê min ê şehîd ez xwîna te digrim" li kolanên Zahedanê hilgirtina wêneyên 3 girtiyên hatin darvekirin li hev kom bûn.

Dewleta Îranê bi girtina beşek ji malbatên girtiyên hatin darvekirin hewl dide rê li kombûnên nerazîbûnê û şopandina xelkê bigire û dengê wan qut bike. Li gorî daxuyaniya çapemeniyê, dezgehên ewlehiyê ji xizmên din re gotine ku girtina wan dê dirêjtir bibe û ger agahdar bin dê rewş dijwartir bibe.

Ji aliyê din ve piştî belavbûna nûçeya bidarvekirina van girtiyan, xelkê hêrsbûyî li navçe û taxên curbicur ên Tahranê dirûşmên dijî hikûmetê berz kirin.

Xelkê bajarokê Negîn, Şahzabe, Tahransar û Ekbatanê dirûşemeyên, "Bimre Xamineyî", "Bimre dîktator", "Bimre komara darvekirî" berz kirin.



## Di hilbijartinan de 'dergûşkîketin'

**Ahmet Aktaş**

Li ser hilbijartinên 14'ê Gulanê gelek şîrove hatin kirin. Hinek hinekan serkeftî û hinekan jî binkeftî nîşan dide.
Li gorî tê xuya kirin, gelo mirov tu alî ne serkeftî û ne jî binkeftî bibîne rastir nîne?
Jiber ku di hemû hevbendiyan de, him aliyên serkeftî him jî yên binkeftî hebûn. Lewma, gelo mirov di zikhev de bêje "hemû hevbendî derkuşkî ketin" ne rastir e?
Ka em hinekî bala xwe bidin gotin û helwestên wan.
Hevbendiya MILET dibêje; hevbendiya CUMHUR bi ser neket.
Ji bo xwe jî, hinek bi şermokî an bi delalî dibêje; em jî negihiştin armancên xwe, lê em ê di hilbijartina cara dudan de bi serkevin! Belê bahsa wê helwesta xwe ya xerab nakin a M.Akşenera ku ji masê rabû çû û paşê jî bi lîsteya navê xwe kete hilbijartinan.
Hevbendiya CUMHUR dibêje; hevbendiya MILET bi ser neket. Ji bo xwe jî dibêjî; erê me armanca xwe bi dest nexist, lê dîsa aliyê herî dengê zêde wergirt em in û di cara dudan de em ê serkeftî bin! Belê, behsa ji bo rêvberiya xwe bide meşandin dengên kêrhatî/têr nestandî nakin. Jixwe heke di rejîmek asayî/normal de bûna, ew rêveberî/hukûmeta wan hilweşiya bû.
Hevbendiya KED û AZADIYÊ jî dibêje; tu hevbendî negihiştin armancên xwe û ne serkeftî bûn.
Erê em jî negihiştin armancên xwe, lê li Kurdistanê em partiya yekemîn bûn û di cara dûdan de em ê serkeftî bin! Belê behsa kêmasiya TIPê bi dengê bilind nakin, nabêjin; bû sedemên ku herî kêm em deh parlementeran ji dest xwe berdin.
Bêguman divê bêrêtî û bêexlaqî û kiryarên bêzagonî yên faşîzma AKP-MHPê, di pêvajoya hilbijartinan de da meşandin neyê paşguhkirin û jibîrkirin.
Bi taybetî jî van kiryarên xwe yên qirêj li Kurdistanê û li dijî Partiya Çepa Kesk(YSP) da birêvebirin.
Hijmarek zêde dengên YSPê hildan, li ser navê MHPê dan jimartin.
Bi vê kiryarê re xwest; di nava MHPê û YSPê de şerekî mezin rûbide. Lê bi hişyariyek hêja, ev lîska R.T.Erdogan negihişt mirazê xwe.
Jixwe êrîşên xwe yên qirker, li Başûr û Rojava jî bêrawestan û bênavber dewam dike.
Li gel vanan, du gumanên din jî yên balkêş hene.
Yek: Bi gurkirina van şerên dijwar, van hilbijartinan çêneke û dema hilbijartinan dûr bixe.
Dudu: Heke hilbijartin çêbibe jî, li gel lîstikan bi huner/sixtekariyên teknolojî ve jî, dengê xwe bilind nîşan bidin. Ger ku derfetên hundur û derve dest bide, bi radeyek dengê zêde serkeftina xwe ragihînin!
Wisa diyar dibe ku ji bo van kiryarên qirêj, derfet di destê faşîzma AKP-MHPê hebûn, lê guman heye ku 'eqlê jor' destûr neda û rê li ber van kiryarên wan ên genî û qirêjtir venekir. Bêguman ew 'eqlê jor', ne hetiriyê qenciya gelê me an jî gelên herêmê bûn. Belê bi tenê ew berjewendên dewletên xwe li ber çavan digrin.
Bêguman êdî gelê me û tevgera wê jî, dikare li goreyî van gumanan tevbigere û gihiştiye vê hişmendiyê! Her wiha dikare ji hilbijartina yekê dersan derxe û di hilbiartina dûdan de serkeftî be.



# Pêşengê şehîdên gulanê, Hakî Karer

Gulan di nava gelê welatparêz ê Kurdistan û Tirkiyeyê de di nava Tevgera Azadiya Kurdistanê de meha şehîdan tê dîtin. Di têkoşîna azadî û demokrasiyê ya PKK'ê ya 40 salan de gelek şehîd hatin dayîn. Her meh bêhejmar şehîd, her roj şervan, lehengên egîd ji bo azadiyê şehîd ketin.

Bi taybetî di meha Gulanê de tên bibîranîn û di bîranîna wan de têkoşîn mezin dibe. Ji bo bîranîna şehîdan, ji bo bîranîna kesên ji bo azadiyê têkoşiyane û xwe fedakirine, weke kevneşopiyeke şoreşgerî û sosyalîst tê dîtin.
Rêber APO got jibîrkirin îxanet e. Ev yek bi taybetî ji bo şehîdan derbasdar e. Yên ku şehîdan ji bîr dikin, ne tenê li lehengên ku ji bo azadiyê xwe feda kirine, xizmên wan û nirxên ku di vê têkoşînê de hatine avakirin û pêşxistin jî xiyanetê dikin.
Yên ku di têkoşînê de şehîd ketin, bi yên li pey wan ketin, bi yên ku çekên xwe girtin û tola xwe hildan, di têkoşînê de nemir bûn, di bîranîna xwe de nemir bûn.
Dibe ku ji hinekan re ecêb xuya bike ku şehîd di nav tevgerê de xwedî nirxekî wisa bilind in. Lê belê weke ku Karayilan eşkere kiriye, têkoşîna azadiyê tenê dema ku mirov ji bo vê dozê amade be dikare bi ser bikeve. Yên ku bawer dikin ku têkoşîna azadiyê bê fedekarî pêkan e, berê xwe dane windakirin û xapandin. Ger têkoşîna azadiyê têkoşînek hêsan bûya, wê hemû civakên cîhanê azad bibûna û jiyaneke wekhev bidomandan e.
Lê ya ku divê bê çareserkirin zîhniyeteke ku 5 hezar sal in mezin bûye û pêş ketiye, pergala serdestiya mêr e. Yên ku bi vê zihniyetê li ser desthilatdariyê bin, wê bi rehetî ji vê hêzê dernekevin. Rêbazên xwe ewqasî tekûz kirine ku bi afirandina zihniyeteke civakî ya li dijî azadiya civakî û azadiya jinê, civak bi hemû beşên xwe ve kirine piştgir. Ji ber vê yekê têkoşîna azadiyê di her kêliya jiyanê de ne tenê têkoşîneke fizîkî ye, di heman demê de têkoşîneke derûnî ye, têkoşîneke manewî ye.
Yên ku ji bo azadiya civaka xwe, azadiya civakên bindest têdikoşin û xwe feda dikin, bi vî rengî rastiya herî mezin, rastiya xwe fedakirina armancên têkoşînê nîşan didin.
Çîrokek li ser sê perperîkên Kurdistanê heye. Sê perperîk li rastiyê digerin. Sê perperîk ronahiyekê dibînin û dixwazin bizanin ka ew çi ye. Perperoka yekem ber bi ronahiyê ve difire, ji dûr ve dinêre û dîsa vedigere. Wî bi rastî fêhm nekir ku ew çi ye, lê ew tenê dikare bibêje ku ew çira ye. Perperîka duyemîn hinekî wêrektir e û nêzîkê ronahiyê difire, lê gava vedigere ew jî nikare rave bike ka çi bûye, lê germahiyek radigihîne ku ew hîs dike. Perperîka sêyemîn rasterast di ronahiyê de difire heya ku ronî bibe. Vê perperîkê ji bo dîtina rastiyê xwe feda kir.
Çîrokeke xwedî wateyeke kûr e. Ji ber ku perperîka sêyem ew-



qas wêrek bû ku rasterast ber bi ronahiyê ve firiya, perperîka din fêr bû ku ew çi ye. Di têkoşîna azadiyê de jî heman tişt e. Mesela, yên ku ji dûr ve nêzikî dijmin dibin, dizanin ku ew dijmin e, lê nizanin. Yên ku piçekî nêz dibin, dibe ku rûyê dijmin bêtir nas bikin, lê dîsa jî rastiyê nizane. Yên ku bi tevahî beşdarî têkoşîna azadiyê dibin, hemû tundiya dijmin hîs dikin, rastiya dijmin nas dikin û ji her kesî re eşkere dikin.
Hakî Karer jî yek ji wan bû. Yek ji wan kesan bû ku bi tevahî tevlî têkoşîna azadiyê bû û tevî ku ne Kurd bû jî ji bo azadiya civaka Kurd têkoşiya. Ji bo ku nirxê şehîdan were naskirin, nêzîkatiya Rêber APO ya li ser şehadeta Şehîd Hakî Karer girîng e.

**Hakî Karer dilsozê têkoşîna azadiyê bû**

Hakî Karer jî yek ji wan bû. Kesek ku bi tevahî dilsozê têkoşîna azadiyê bû û tevî ku ne Kurd bû jî ji bo azadiya civaka Kurd têkoşiya. Ji bo nirx û nirxê şehîdan were fêmkirin, girîng e ku şehadeta Heval Hakî Karer were fêmkirin.
Şehadeta wî gelek rastî derxistiye holê. Heval Hakî Karer di 18'ê Gulana 1977'an de şehîd bû û bû yekemîn Şehîdê ku bandoreke mezin li tevgerê kir. Hêzên faşîst ên li Tirkiyeyê bi vê yekê dizanîbûn û bi qetilkirina Heval Hakî Karer plan dikirin ku komkujiyê pêk bînin. Piştî ku şehadeta wî di nava Hevalan de hat bihîstin, gelek kes hestiyar bûn û xwestin tola wî hilînin.
Cenazeyê Heval Hakî rakirin Nexweşxaneya Dîlokê, hevalan xwestin wî bigirin, lê dijmin destûr neda. Ger Rêber APO mudaxele nekiriba wê komkujî pêk bihata. Şehadeta Heval Hakî tevger xiste rewşeke pir giran, diyar bû ku yan "li vir û şûnde" yan jî "li vir û şûnde". Rêber APO "dewam bike!" lê diviyabû ji bo "çawa bimeşe" amadekarî û gavên nû hatin avêtin. Rêber APO bi aqil û pêşdîtina xwe tevger ji vê rewşa xeter û zor derxist.

**Her şehîdek bû sedema berdewamkirin û mezinkirina têkoşîn û rêxistinbûnê**

Hat plankirin ku Heval Hakî li Dîlokê ji aliyê koma Stêrka Sor ve hat qetilkirin û ev ne tesaduf bû. Stêrka Sor bi xwe komeke biçûk bû ku mirov dikare jê re bibêje grûpeke sîxuriyê, ku ji aliyê kurdan, komên çep ên Tirkiyê, PDKê û yên din ve ji bo rêgirtina li belavbûna PKKê hatiye avakirin.



Vê komê Hakî Karer qetil kir û hinek ji PDK, THKO û THKP-C jî di vê kuştinê de cih girtin.
Hakî Karer çima şehîd ket? Ji ber ku Hakî Karer tirkekî ji bo Kurdistanê û kurdan têdikoşe û bi saya xebata wî dewleta tirk rastî şikestinên giran hat. Gelek ciwanên Tirk bi têkoşîna Hakî Karer a ku ji bo dewletê neketiye nava tevgerê. Xebata wî tifaqa bi gelê Kurd re xurt kir û hilweşîna dewleta Tirk amade kir. Ji ber vê yekê dewleta Tirk êrîşî komeke ku bi giranî ji aliyê Kurdan ve hatibû organîzekirin ji bo propagandeya xwe kir. "Binêrin Hakî Karer ji bo kurdan dixebitî, niha kurdan ew kuştin!" Dewlet bi vî awayî xwest ku nehêle zêdetir ciwanên tirk tevlî bibin û tifaqa civaka tirk û kurd têk bibe. Ev qetlîam yek ji gelek planên li dijî tevgerê û Rêber APO bû û di nava xwe de gelek rastî derxist holê.

Bi şehadeta wî re pirsa xweparastina tevgerê, pirsa berdewamkirina têkoşînê derket pêş. Heger tevger ev rewş analîz nekiriba û fêm nekira, nikarîbû gavên din biavêta û di serî de jî nedikarî bidomiya. Tevger heta îro rastî gelek rewşên wiha hatiye ku pirs derdikeve holê ka dê çawa bidome an na. Lê Rêber APO her tim got "dewam bike" û gavên nû avêtin. Şehadeta Heval Hakî Karer bi vî rengî bû sedema têkoşînek mezin û rêxistinbûnek mezin. Bû xeta PKK'ê, bû ala PKK'ê. Bi dersa ku ji şehadeta wî hat girtin, her şehîdek bû sedema berdewamkirina têkoşînê û mezinkirina têkoşîn û rêxistinbûnê. Ev jî rastiyeke din a ku bi şehadeta Heval Hakî derket holê û îro jî hêza pêşeng a PKK'ê ye.

**Rêber APO şehadeta Heval Hakî kir bingeha avakirina PKK'ê**

Koma piçûk a ku dest bi amadekariyên Têkoşîna Azadiyê ya Kurdistanê û piştre jî têkoşîna PKK'ê kir, bê çek bû. Heta wê demê ew komeke bîrdozî bû ku nedixwest şerê çekdarî bike. Lê bi qetilkirina Hakî Karer re derket holê ku ji bo parastina xwe pêwîstiya komê bi çekan heye. Heger ne çekdar bûna, wê ji aliyê fizîkî ve xilas nebûna. Vê rastiyê şehadeta Heval Hakî bi awayekî zelal derxist holê.
Rêber APO şehadeta Heval Hakî kir bingeha rêxistin û PKK'ê û ev xet pêşxist. Rêber APO kir ku Hakî Karer bi PKK'ê re bijî û got, "Hakî Karer PKKê ye. Hakî Karer zîhniyet û şêwaza PKK'ê ye."
Ji ber vê yekê Rêber APO di nava tevgerê de nirxê nemiriyê afirand û hişt ku Heval Hakî Karer bi PKK'ê re bijî. Ji bo fêmkirina PKK'ê divê baş were fêmkirin. Sedemên ku têkoşîn û rêxistinbûnê xurt dikin şehîd in, her tişt ne PKK ye. Rêber APO bi dilsozî û Hevaltî ev yek pêşxist û li ser vê bingehê bi helwesta xwe ya li hember şehîdan ev yek eşkere kir. Ev xeta PKK'ê bû, xwedî nirx bû û xwedî exlaq bû.

FENER



## Bila Derba 28 Gulanê Mekintir Be

**Idrîs Henan**

Hilbijartinên 14' Gulanê jî li dar ketin. Tevî rêjeya bilind a beşdariyê, diyar bû çiqas çanda hilbijartinê li vî welatî lawaz maye û mirovên li dora civakbûyîna desthilatdariyê civiyane, esîrê tijekirineke cemawerî ya vala ne. Herdû aliyên hevrikên desthilatê; (itîfaqa gel – itîfaqa cimhûr), bê ku guh bidin çareseriya bingehîn a pirsgirêkên cidî yên welat, bi rêbazên windakirin û jirêderxistinên siyasî yên kûr, bi veşartina rastiyan û xapandina raya giştî re, dengên gel xistin rewşeke şîlo ku êdî nema dikare dengê xwe bi awayekî azad bi kar bîne. Ji xwe tirsandin, terorkirin, serdegirtin û oparasyonên qirkirina siyasî li her derê berbelav bibûn.
Pirsên çavdêriya biyanî ev yek zelaltir dikirin. Raya giştî ya cîhanê jî têgihaşt ku hilbijartinên 14' Gulanê him yekparebûna xwe û him jî belansa wekhevî û edaletê ji dest dabûn. Erdogan, partiya wî, itîfaqa wî, saziyên dewletê û îmkanên wê bi awayekî keyfî ji bo xwe bi kar dianîn. Lew re; kampanyaya Kilîçdaroglu ji aliyê medyaya Tirkiyê ve hatibû paşguhkirin. Mirov digot qey Kilîçdaroglu namzêtê serokkomariya "Mozembîq e"? Lê ya Erdogan û MHP, kêlî bi kêlî, nefes bi nefes dişopandin. Ji ber vê jî me dît ku berî encamên fermî derkevin, çawa xwe serkeftî nîşan dan û raya giştî tevlîhev kirin. Vê yekê bi hatina ser sindoqan re isbat kir ku siyaseta Tirkiyê kirîzeke kûr jiyan dike.
Tevî hemû hewldanên li jor me rêz kirine û çewsandina desthilatdariyê ji îmkanên dewletê re, ajîtasyon û propagandayên medyayê, encamên derketine vê yek isbat dikin. Ne ol û ne jî netewperestiyê, serketina mutleq jê re anîn. Di bingeh de ne li benda encameke wisa bûn. Ne hilbijartinên serokkomariyê û ne jî yên parlamantoyê bi ser xistin. Herdû jî di bin zexta koalisyonan de man. Aliyek din ve; herdûyan jî hêza xwe ya referandûmê wenda kirin û hêza jin û ciwanan a ji sûcên desthilatdariyê re gotiye "Êdî Bes e" derket pêş. Êdî kîjan alî jî bi ser keve, wê hedê wî sînordar be. Aliyê xwe ve Kurdan û kîtleya demokratîk isbat kirin ku; yekîtiya gelan dikare rê li ber projeyên faşîzmê bigire û çendîn asta hovîtiya ku tê meşandin bilind be, fedekariya gel dikare rê li ber bigire û ji nav bibe. Carek din eşkere bû ku di helwesta gelê Kurd de guhertin çênebûye. Tevî hemû hewldanên qirkirin, zindanîkirin, zilm û zordariya bilind, diyar bû ku gelê me li Bakurê Kurdistanê ji bo azadiya xwe tawîz nedaye û faşîzm li Kurdistanê bi biryardarî têk biriye. Berovajî analîz û gotinên helwest û nêzîkatiya gelê me lawaz dibînin, gelê me di têkoşîna xwe ya azadî û demokrasiyê de gav paş ve neavêt û Kurdistan ji projeyên dagirkeriyê re kire goristan. Girîngî û dirustbûna sekna gelê me piştî çend roj di ser hilbijartinan re derbas dibin, xwe didin der. Ango; helwesta gelê me, bersiva pêşwext ji gotinên wezîrê faşîzmê Soylo re bûn ku carek din li ser ekranan projeya xwe ya millî rêz dikir û weke sedsalên navîn, belgeyên hemwelatîbûnê li xelkê belav kirin. Gelek eşkere projeyên xwe vedibêjin, lew re, pêwîste di 28 Gulanê de jî, helwesta li dijî faşîzmê hê zelaltir, bihêztir, û mekintir be ku seradên fena Erdogan û Soylo bi yek derbê ji nav bibin.